| | |
|---|---|
|  Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl) |  wergera ji erebî: Mustefa Reşîd |



# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 3

## Mîra Madan..û Baxên Bala

Heft ecayîbên (elawet, derhoze) cîhanê yên kevin hene ku ew jî evin: *Pîramîda Xofo* li Misirê, *Baxên Bala* li Babil (Mêzopotamiya), *Perestgeha Artemîs* li Turkiya niha, *Peykerê Ziyos* li Yûnananê, *Gora Mosolos* li Turkiya niha, *Kolosê Rodos* li girava Rodos ya Yûnanê û *Birca Çiris* ya bajarê Îskenderiyê li Misirê.

Sedema avakirina *Baxêb Bala* li Babil mîreka Kurd ya mîdî bû. Va ye berfirehiya vê mijarê.

### Dijberiya Aşûrî - Mîdî:

Di destpêka hezarsala duwem ya b. z. da Aşûriyên samî beşê rojava yê welatê *Sobarto* (beşê rojava ji xaka Federasiyona Başûrê Kurdistanê ya niha) dagîr kirin û li wir padîşahiyek avakirin ku hin caran bihêz dibû û hin caran jî lawaz dibû. Di hezarsala yekem ya b.z. da êdî vê *Padîşahiya Aşûr* li rojavayê Asiyayê bû xwedî desthilatdarî û siyaseteka zordar beramber gelên cîran birêve bir. Her kesê ku ji bin fermana wê derketa bi tundî û hişkî dihate sezakirin. Padîşahên Aşûriyan êrişên leşkerî yên mezin destpêdikirn daku serhildêrên Madan li çiyanên Zagros û derdorên wî têxin bin fermana xwe û her wisa ji bo têkbirina her hêzeka ku pêra têketa dijberiyê.

Di sedsala 8-an b.z. da rêberekî niştîmanî mîdî aqilmend û leheng peyda bû ku navê wî Deyako (Dehyako, Dioces) bû. Vî rêberî êl û hozên mîdî di şêweyê federasiyonekê da, hêza wan kire yek, *Padîşahiya Madan* damezrand, bajarê Ekbetana (Acbatana, Amedan, Hemezan) kire paytext, leşkerekî mîdî avakir û têkoşa ku welatê Madan ji desthilata aşûrî rizgarbike. Piştî çend şer û pevçûnan Deyako dîl hate girtin. Di pey ra

kurê wî Feraût (Phraortes) ala şoreşê li dijî *Padîşahiya Aşûr* hilda. Piştî çend şeran ew jî di qada şer da hate kuştin.

Di pey ra nobe hat Keyxusro (Kai-Khuosru) kurê Feraût ku ew rêveberiya *Padîşahiya Madan* bike û li hember *Emperatoriya Aşûr* raweste. Ev rêber xwedî dîtineka strategî dûrbîn, siyaseteka pragmatîk û xwedî taybetmendiyên rêveberî bû ku kêm wisa peyda dibin. Wî careka din êlên Mada kirin yek, dezgehên rêveberiyê bi pêş xistin û leşker li ser bingeheka nûjen birêxistin kir. Di pey ra li gel *Padîşahiya Îlam* li başûr û *Padîşahiya Babil* ya keldanî li rojava hevpeyman danî. Hevpeymana wî li gel padîşahê keldanî *Nebopolezar (Nabopolasser)* ji aliyê strategî va ya here girîng bû. Daku ev hevpeymana mîdî-babilî xurt û tikûz bike, razî bû ku keça xwe *Omîd (Amîts, Amytis)* (bi kurdî Hêvî) li gel kurê padîşahê keldanî û cihgirê bavê xwe *Neboxezneserê Duwem (Nebuchadnezzar II)* bide mehirkirin. Di pey ra Mad û Kildanan dikarîbûn di sala 612-an b.z. da *Emperatoriya Aşûr* biroxînin.

## Amedan Paytextê Madan:

Paytextê Madan *Ekbetana* (*Amedan*, di jêderên erebî da Hemezan hatiye gotin) li kuntara çiyayê Elwend (Alwand) dikeve. Gava li jor berfa çiyayê Elwend diheliya li jêr hemû dibûn kanî, bajar û herêmên derdora wî pê dihatin avdan û wisa her der dibû bihuşteka kesk. Li *Amedan* gora feylesofê navdar Ibin Sîna û gora helbestvanê Kurd yê Lor Eryan jî heye.




Erdnîgariyê navdar *El-Qezwînî* (1283 z. wexer kiriye) derbarê danasîna bajarê *Amedan* da dibêje: "**Bajarekî rûmetdare, çarçewa wî firehe, bayê wî nazike, ava wî pir xweşe, axa wî berhemdare, hên jî warê textê padîşahane (paytext), sînor ji dewlemendiya wî û pirbûna**

**darên fêkiyan ra nîne, rûniştivanên wî yên here zimanşêrînin, xwedî taybetmendî û sinciyên here nazik û başin. Ji taybetmendiyên vî bajarî ewe ku mirov li wir xemgîn nabe; çiqas bela jî hatibin serê wî. Gelê bajêr bi awaz, şahî û stranin**".

Madan di dema padîşahê xweyî yekem *Deyako* da ev bajar ne bi tenha ji bo xweşikbûna surişta wî ji xwe ra wek paytext hilbijartibûn, lê belê ji ber ku di vî bajarî ra *Rêya Hevrîşim* (herîr) ya bazirganiya cîhanî jî derbas dibû ku rojhilat û rojava digihandin hev. *Deyako* ferman dabû ku ev bajar xweşik bê avakirin û baş bê parastin. Dîroknasê yûnanî *Herodot (Herodotes)* dibêje:

"**Madan careka din fermanên Deyako pejirandin û ev bajarê ku niha bi navê Ekbetana tê naskirin avakirin. Bajar xwedî sûrên pir têkûze, ber bi esman va bi awayê xelekên li pey hev bilind dibe. Pilana bajê wisa hatiye danîn ku her sûrek ji ya berî wê bilindtire. Cihê ku bajar lê hatiye avakirin li ser girekî ye ku heya radeyekê alîkariya vî pilanî dike. Lê belê sedema bingehîn ku bajar baş tê parastin hunera avakirinê ye ku hatiye bikaranîn. Ev xelekên sûran gihîştine heft xelekan û di ya dawî da qesra padîşah, keware û embar têda ne.**


**Xeleka sûra derva hema dişibihe sûra bajarê Atînayê. Kevirên vî dîwarî ji berê sipî ne, di pey ra rêzek ji kevirên reşe, di pey ra rêzek ji kevirên sore, di pey ra kevirên ji rengê hişînin û rêzê pêncan ji sorê narincî ye. Ev hemû rêz hatine boyaxkirin, lê rêzên dawiyê bi rengê zîvî û zêrî hatine boyaxkirin. *Dioces* ev hemû têkûzkirin ji bo parastina xwe û qesra xwe avakiriye**".

Li vî paytextê padîşahî pir bedew mîra Madan *Omîr* çavên xwe li jiyanê vekirine. Di nav van dîmenên suriştî û têvel da mezin bûye û di vê qesra bilind da dema bengînî û xortaniya xwe derbas kiriye. Lê belê hesabên siyasî hiştin ku ew dest ji welatê xwe, yê xwediyê çiyayên bilind, deştên bi keskayî, yê tijî çem û kanî, tijî gul û çîçek û tilûr, berde û bibe kebaniya cihgirê padîşahê Babil.

## Baxên Bala li Babil:

Em bi temamî nizanin kîjan salê mîra Madan *Omîd* gihîştiye paytext Babil. Lê belê bê guman ev pêş sala 612-an b. z. bû. Helbet, ji bo mîra Madan, dota çiyayên Kurdistanê, gelek zor bû ku li deştên Mêzopotamiya yên germ û bêyî bedewiya suriştê bijî; ev deştên ku pir caran buhranên qumê ji biyabana erebî bi ser da tên. Wisa tê xuyakirin ku malxoyê wê, padîşah *Neboxezneser* yê ku sala 605-an hatiye ser text, lê hay bûye ku kebaniya wî ya bedew xemgîne û jiyana çiyayên welatê wê herdem bi bîra wê tê. Ji bona vê rewşê xwastiye vê xemgîniya wê sivik

bike û wisa li bajarê Babil hawîrdoreka wisa biafirîne ku dişibihe hawîrdora çiyayên Madan û qesra padîşahî li Amedan. Rabûye ferman daye ku ev *Baxên Bala* yên bi nav û deng bêne avakirin, evên ku di dîrokê da yek ji heft elawetên navdar di cîhana kevnar da ne.




wêneyekî xeyalî yê padîsah Omîd




Padîsah Neboxezneser

Dîroknas *William James Durant* di danasîna *Baxên Bala* da dibêje:

**"Ev Baxên Bala bi 600 yard bi aliyê bakur da ji Birca Babil dûr bûn û li ser bilindahiyekê bû ku jêra Qesir dihate gotin. Li vir padîşah Neboxezneser qesra xwe ya payebilind avakiribû û di nawenda vê avahiyê da koşka xwe ya sereke ya ji dîwarên xweşik bi qermîtê zer û bi batona sipî û nexişkirî lêkiribû. Banên wê bi nexşên diyar bi rengê hişîn bû; diteyisî û dibiriqî. Dergahên wê bi peykerên mezin yên şêran ji kevirên reş dihate parastin.**



Wêneyekî nîgaşî yê Baxên Bala

**Li nêziya vê bilindahiyê ev Baxên Bala yên bi nav û deng hebûn ku Yûnanan (Girekan) wek yek ji heft elawetên cîhanê hejmartine. Ev li ser hîmên gilover yên her qatekî di ser hev ra danîne. Sedema avakirina van baxan ew bû ku Neboxezneser bi keça Sîkars (Keyxusro) padîşahê Madan ra zewicî bû. Bi vê mîra bedew germahiya tava Babil û axa wê pir giran û zor bû, wê pir bîra keskahiya welatê xwe yî çiyayî dikir. Payedarî û mêraniyê hêşt ku Neboxezneser ji bo wê van baxên bedew avabike. Serbanên van baxan bi çîneka ji axa here baş tijî kiribû. Stûrbûna çîna axê çend pêyan bilind bû, ne tenha ji bo çandina kulîlk û darên xweşik, lê belê têra darên bilind jî dikir yên ku damar û rîçalên xwe kûr bi axê da berdidin û bi jor da bilind dibin.**"



Wêneyekî nîgaşî din yê Baxên Bala

*William James Durant* bi ser da zêde dike û dibêje: "**Av ji çemê Ferêt bi nawel û acetên ku di jêr da veşartî bûn derdixistin heya qatê herî jorîn. Li ser van nawel û acetan kole li ber hev dibûn bedel. Li ser banê here jorîn ku bilindahiya wê 75 pê bûn (dora 22,5 metir) xanim û xizmetkarên qesrê bê hîcab û perde diçûn û dihatin bêyî ku tikes ji gelê asayî wan bibîne, li derdora wan gul û kulîlkên regareng û bihinxweş dagirtî bûn û li jêrî wan, li deşt û kolanên bajêr gelê welêt, çi mêr û çi jin, diçûn û dihatin, tevin çêdikirin, xanî avadikirin, barên giran hildigirtin, zarokên wan çêdibûn, çi keç û çi xort, daku ew jî piştî mirina wan van karan berdewam bikin**".



Wêneyekî nîgaşî sêhem yê Baxên Bala

Eve çîroka *Baxên Bala* yên bajarê Babil û heger ne ji mîra Madan *Omîd* bûya, ewê nehatana avakirin.

Çarşemb, 15.04.2015

## Jêder:


1- Dyakonov: Mîdiya, rûpel 283. Taha Baqir û kesên din, dîroka Îranê ya kevnar, rûpel 41.

2- Mamûn Beg Bin Peyke Beg: Bîreweriyên Mamûn Beg Bin Peyke Beg, rûpel 23, serinc (42).

3- El-Qezwînî: Şopên welatan û nûçeyên perestdaran, rûpel 483.

4- Herodotes: Dîroka Hêrodot, rûpel 77 - 78.

5- William James Durant: Dîroka şaristaniyê, bend 1, C 2, rûpel 199.

6- William James Durant: Dîroka şaristaniyê, bend 1, C 2,